# Bultena heftane

# 19/8/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## Ji Women Deliver: Hêza esasî bi hêzbûna kurevî ya jinan pêkan e

Koordînatora Komaleya Çareseriyên Nû-Mafên Mirovî yên Jinan Zelal Ayman a beşdarî Women Deliver 2023 bû ku li Ruanda hat lidarxistin got, “Hêza esasî bihêzbûna jinan a kurevî ye. Hêza di nav welatan de tenê bandorê li wê welatê dike, li kurevî nake.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-women-deliver-zelal-ayman-heza-esasi-bi-hezbuna-kurevi-ya-jinan-pekan-e-40479

Çavkanî:JINHA




## Di merasîma Kûpaya Cîhanê ya Jinan a FIFA 2023 de tacîza zayendî

Di merasîma xelatê de lîstikvan Jennifer Hermoso rastî tacîza zayendî a Serokê Yekîtiya Futbolê ya Spanyayê Luis Rubiales hat.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-merasima-kupaya-cihane-ya-jinan-a-fifa-2023-de-taciza-zayendi-40511

Çavkanî:JINHA



## Rêxistina Efû ya Navnetewî: Sînorê stemkariya rayedarên Îranê nîn e

Rêxistina Efû ya Navnetewî diyar kir ku rayedarên Îranê bi awayekî keyfî endamên malbatên kesên di serhildana "Jin Jiyan Azadî" de hatin qetilkirin, girtin, gorên kuştiyan hilweşandin û bîranînên bi tundî tepeser kirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/rexistina-efu-ya-navnetewi-sinore-stemkariya-rayedaren-Irane-nin-e-40515

Çavkanî:JINHA




## Jinek ji ber xwe ji êrişkar parast, hat cezakirin

NAVENDA NUÇEYAN - Jinek dema rastî êrişek zayendî hat, bi saya perwerdeya boksê êrişkar li erdê xist. Dadgeha welêt bi hinceta pir hişk bersiv daye êrişkar, bi tarîfa, dûzen û hizûra raya giştî xira kiriye' cezayê pere da mexdûra êrişê. Dadgeha Qeredax bi biryara skandal bu rojeva sereke ya welat.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216508

Çavkanî:JINNEWS



## Boko Haram 42 zarok û jin revand

NAVENDA NÛÇEYAN - Rêxistina Boko Haram li Jîjeryayê êrişî kesên dar kom dikirin kir û 42 jin û zarok revand.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216610

Çavkanî:JINNEWS



**Rojhilata navîn**

# Li Elbakê destdirêjî li jineke ciwan hat kirin

WAN – Li navçeya Elbakê cerdevan B.A destdirêjî li jineke ciwan kir.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216233

Çavkanî:JINNEWS




# Encamnameya konferansa Beyrûdê hat aşkerakirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Encamnameya Konferansa Tecrubeyên Tevgerên Jinan a Navneteweyî hat aşkerakirin û wiha hat gotin: "Komîteyên hiqûqî werin avakirin, hemleyên herêmî yên stratejîk werin destpêkirin da ku banga serbestberdana ramyarê kurd ê navnetweyî dîlgirtiyê fikrê azad û dostê azadiya jinê birêz Abdullah Ocalan were serbestberan."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216303

Çavkanî:JINNEWS



## Tevî nêviya xwe hêviya vegera gundê xwe dijî

Fatma Kara ya ku li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê navê gundê xwe Hilal li neviya xwe kiriye û Hilal Kara ya ku li ber çîrokên gundê xwe yên dapîra xwe mezin bûye, gundê wê yê ku tu caran nedîtiye di xeyalên wê de zindî dibe.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/tevi-neviye-xwe-heviya-vegera-gunde-xwe-diji-40477

Çavkanî:JINHA



## Ghaizlan Al-Mamounî bi komeleya xwe ji bo mafên jinan têdikoşe

Komeleya Kayfa Mama Kayfa Baba, li dijî hemû şêweyên cihêkarî, zordarî û tundiya zagonî ya dijî jinan têdikoşe.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/ghaizlan-al-mamouni-bi-komeleya-xwe-ji-bo-mafen-jinan-tedikose-40480

Çavkanî:JINHA



# [Jinên ji konferansê: Li dijî newekheviya zayendî divê em dengê xwe bikin yek](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-ji-konferanse-li-diji-newekheviya-zayendi-dive-em-denge-xwe-bikin-yek-40483)

Jinên beşdarî Konferansa Navneteweyî ya Tecrûbeyên Tevgerên Jinê a ku li Beyrûtê bûn diyar kirin ku divê jin li dijî newekheviya zayendî ya herêmî û navneteweyî dengê xwe bikin yek.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-ji-konferanse-li-diji-newekheviya-zayendi-dive-em-denge-xwe-bikin-yek-40483

Çavkanî:JINHA




# [Ji bo jinên Silêmaniyê xebata ‘hayjêbûn ê’](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-bo-jinen-silemaniye-xebata-hayjebun-e-40487)

Perwerdeya “Pêşniyarên Pirjimar Ji bo Pêşxistina Jinan û Çareserkirina Pirsgirêkan” ku ji bo jinan li Silêmanî hatibû lidarxistin bi dawî bû.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-bo-jinen-silemaniye-xebata-hayjebun-e-40487

Çavkanî:JINHA



## Cezayekî mîna xelatê dan 'melayê' jin û zarok kirin hedef

NAVENDA NÛÇEYAN - Melayê bi navê Mehmet Şukru Dortbudak li Rihayê jin û zarok hedef girtibûn. Diyanetê, weke ceza ji mûçeyê Dortbudak 500 lîre birî.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216348

Çavkanî:JINNEWS



## Di salvegera serhildanê de tundî zêde bû

NAVENDA NÛÇEYAN - Bi nêzîkbûna salvegera qetilkirina Jîna Emînî re, zextên dewleta Îranê zêde bûne û herî kêm 23 çalakvan û welatiyên Kurd hatin girtin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216339

Çavkanî:JINNEWS



## Hejmara nû ya Kovara Jinê derket

STENBOL - Hejmara nû ya Kovara Jinê ku her roja yekşemê derdikeve, bi sernavê “Netewa Demokratîk mifteya jiyana azad û wekhev e” vê hefteyê jî li pêşberî xunerên xwe ye.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216338

Çavkanî:JINNEWS




## Çîroka jinên ji qirkinê derbas bûn bi 'Serhildana Zerîyan' rave kir

ŞENGAL - Çîrokên wê jinan rave dike, nivîskar jin e, yên ku ji bo weşanê amade kirin jin in...Pirtûka "Serhildana Zerîyan" ya Rojnameger Rojbîn Denîz nivîsandiye balê dikşîne ser civakek bi qirkirinê rû bi rû maye, balê dikşîne ser çîroka jinên Êzidî. Rojbînê li ser destpêk û dawiya çapkirina vê pirtûkê axivî.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216322

Çavkanî:JINNEWS



## 'Divê alavên tenduristiyê ji bo jinan bê pere bin'

STENBOL - Bijîşk Irmak Saraç, diyar kir ku ji ber zêdebûna bihaya alavên tenduristiyê jin pirsgirêkên tenduristiyê dijîn û divê alavên tenduristiyê bê pere bin û her kes bikare xwe bighîne û got: "Ji bo vê jî divê polîtîkayên hikûmetê jî di vî alî de biguhere."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216320

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Riya rizgariya gelê Efganistanê di yekitiyê de derbas dibe’

Parlamentera berê ya Efganistanê Belqis Roshan bi boneya salvegera duyemîn a desteserkirina Efganistanê ji aliyê Talîbanê ve peyamek ji ajansa me re şand û diyar kir ku çareserî yekitiya gelê Efganistanê ye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/riya-rizgariya-gele-efganistane-di-yekitiye-de-derbas-dibe-40502

Çavkanî:JINHA



## ‘Nebûna jinan di navendên biryardayînê de valahiyan çêdike’

Pispora siyasî Abeer Bashir diyar kir ku tiştên jinên Filistînî di gelek salan de kirine ji bo hebûna wan û nûnertiya wan a di navendên biryardayînê de ye lê negihîştine asteke baş.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/nebuna-jinan-di-navenden-biryardayine-de-valahiyan-cedike-40496

Çavkanî:JINHA



## Rojnamevaneke tunisî: Tenê deng û tevgerên jinan wan diparêzin

Rojnamevana tunisî Zihûr El Meşriqî destnîşan kir ku tecrube îsbat kirin ku qanûn nikarin jinan biparêzin. Tenê dengê wan, tevgerên rastîn ên jinan û koordîneya sînornenas wan diparêzin.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/rojnamevaneke-tunis-ten-deng-tevgern-jinan-wan-diparzin-h77516.html

Çavkanî:ANHA



## [Leşkeran li Xîzanê baxçe talan kirin û bi dehan dar birîn!](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/leskeran-li-xizane-baxce-talan-kirin-u-bi-dehan-dar-birin-40507)

Li gundê Xelapur ê Xîzanê di dema qedexeya derketina derve de baxçeyên gundiyan ji aliyê leşkeran ve hatin talankirin û darên wan hatin birîn. Gundiyan bertek nîşanî gotina "Ji ber ku em deng nadin vê zilmê dikin" bertek nîşan dan.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/leskeran-li-xizane-baxce-talan-kirin-u-bi-dehan-dar-birin-40507

Çavkanî:JINHA



## Çalakvana Xezayê: Ji bo aşitiyê xebatên hevpar pêwîst dike

Çalakvana mafên mirovan Hanadî Akila diyar kir ku ji bo ku mafê jinan di pevçûnên çekdarî de bên parastin divê peyamana Cenevrê were pêk anîn û got: “Ji bo bidestxistina têgînên ewlekarî û aştiyê xebatên hevpar pêwîst dike.”

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/Calakvana-xezaye-ji-bo-asitiye-xebaten-hevpar-pewist-dike-40508

Çavkanî:JINHA



## [Dr. Kerîma El-Hefnewî: Divê li dijî tundiyê toreke navdewletî bê avakirin]()

Dr. Kerîma El-Hefnawî destnîşan kir ku divê têkoşîna azadiya jinê û wekheviyê bidome û bang li hemû tevgerên jinan kir ku ji bo bidestxistina cîhaneke bê tundiyê torekî ava bikin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/dr-kerima-el-hefnewi-dive-li-diji-tundiye-toreke-navdewleti-be-avakirin-40512

Çavkanî:JINHA



## KJAR'ê belavokek derbarê beşdarbûna jinan ya di siyasetê de belav kir

Komîteya Lêkolînê ya Komeleya Jinên Azadî ya Rojhilatê Kurdistanê bi ser navê 'Beşdarbûna jinan di siyasetê de, mîsogeriya civaka demokratîk e' belavokek belav kir.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/kjar-e-belavokek-derbare-besdarbuna-jinan-ya-di-siyasete-de-belav-kir-40517

Çavkanî:JINHA



# [Şertê girtina serê xwe li Îranê hat erêkirin](https://anfkurdi.com/jin/Serte-girtina-sere-xwe-li-Irane-hat-erekirin-172896)

Salek piştî qetilkirina Jîna Emîniyê, komîsyoneke parlamentoya Îranê heşkkirina şertê girtina serê xwe erê kir. Bi qanûna nû ya girtina serê xwe, yên qanûnê binpê bikin wê bi cezayên girantir bên cezakirin.

https://anfkurdi.com/jin/Serte-girtina-sere-xwe-li-Irane-hat-erekirin-172896

Çavkanî:ANF




# [Meclisên Jinan li Îzmîrê konferans li dar xistin](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216421)

ÎZMÎR - Meclisa Jinan a HDP’ê û Partiya Çep a Kesk ji bo têkoşîna jinan a serdema nû berfireh bike, konferansek li dar xistin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216421

Çavkanî:JINNEWS



## Li Îranê serîgirtina bi zorê ji aliyê komîsyonê ve hat erêkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Zagona der barê serîgirtina bi zorê de li Îranê di komîsyona meclisê de hat erêkirin. Li bendê ye ku bi vê zagonê re jinên ku serê xwe negirin wê cezayên girtîgehê yan jî pere bigirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216456

Çavkanî:JINNEWS



## 8 jinên li dijî rejîma Talîban derdiketin hatin girtin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li Efganistanê 8 jinên li dijî rejîma Talîbanê li ber xwe didan hatin binçavkirin û piştre hatin girtin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216454

Çavkanî:JINNEWS



## Li dijî hişmendiya baviksalarî û talanker têkoşîna jinê ya xwezaparêz

AMED - Melek Turay a ku wek xwezaparêzekê 30 sal in karê kulîlkfiroşiyê dike, derbarê şewitandina daristanên Çiyayê Cûdî û talankirina xwezaya Kurdistanê de wiha got: "Xwedê avekê li vî agirî bike. Gelê me bindest û feqîr e, bila destên xwe bi daran nedin. Tunebûna xwezayê, tunebûna mirov e. Li dijî êrişa li ser xwezayê em ê xwezayê biparêzin."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216441

Çavkanî:JINNEWS



## Li Kirmanê kirîna benzînê ji bo jinên motosiklet diajon hat qedexekirin

Li bajarê Kirmanê yê Îranê firotina benzîn ji bo jinên ku motosikletê bi kar tînin hat qedexekirin. Hiqûqnasan ji jinan xwest li hemberî qedexeya dijqanûnî gilî bikin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-kirmane-kirina-benzine-ji-bo-jinen-motosiklet-diajon-hat-qedexekirin-40530

Çavkanî:JINHA



## Parêzer Eşwaq Necîb: Mafê jinan tê binpêkirin

Parêzer Eşwaq Necîb a rewşa jinan li Herema Federal a Kurdistanê nirxand, destnîşan kir ku di zagonên heyî de hişmendiya mêr serwer e û bi bal kişand ser nebûna zagonên taybet ên ji bo jinan got: “Mafên jinan tê binpêkirin.”

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/parezer-eswaq-necib-mafe-jinan-te-binpekirin-40529

Çavkanî:JINHA



## Şirovekara Fîlîstînî: Divê tevlîbûna jinên ciwan a qada siyasî bihêz be

Şirovekara siyasî ya Filistînî Reham Odeh anî ziman ku hişmendiya mêrsalarî ya civakê rê nade jinên ciwan Filistînî nêrînên xwe derbirînin û planên xwe di siya gelek qeydan de pêkbînin.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/Sirovekara-filistini-dive-tevlibuna-jinen-ciwan-a-qada-siyasi-bihez-be-40528

Çavkanî:JINHA



## [‘Têkoşîna rêxistinkirî yek ji pîvanên misogerkirina azadiya jinan e’](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/tekosina-rexistinkiri-yek-ji-pivanen-misogerkirina-azadiya-jinan-e-40522)

Çalakvanên ku beşdarî konferansa jinan a di 18-19’ê Tebaxê de li paytexta Lubnan Beyrûdê hat lidarxistin bûn teqez kirin ku têkoşîna rêxistinkirî yek ji pîvanên azadiya jinan e.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/tekosina-rexistinkiri-yek-ji-pivanen-misogerkirina-azadiya-jinan-e-40522

Çavkanî:JINHA




## ['Ez ê têkoşîna xwe ya li dijî êrişên li ser ziman bidim'](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216492)

AMED - Filiz Atalay da zanîn ji bo zimanê kurdî pêş bikeve, bidome çi ji destên wê bê wê bike û wiha got:"Ji bo qursên ziman, ji bo kesên dixwazin kurdî hîn bibin dixwazim piştgiriyê bidim. Li dijî zextên tên kirin ez ê her tim têkoşîna xwe bidim."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216492

Çavkanî:JINNEWS



## `Şoreşa jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nimûneya zindî ya berxwedanê ye”

Lêkoler û femînîsta sûdanî Nîmet Koko Mihemed şoreşa jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê silav kir û destnîşan kir ku belavbûna wê şoreşê li deverên şer û kirîzan ên Rojhilata Navîn dê roleke girîng di avakirina tevgereke demokratîk a jinan de bilîze.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/soresa-jinan-a-bakur-rojhilat-sriyey-nimneya-zind-ya-berxwedan-ye-h77593.html

Çavkanî:ANHA



## Destavêtina bi destê cerdevanan polîtîkaya şer e

Li Wanê destavêtin û destdirêjiya ku cerdevan li jinan dikin, bêceza têne hiştin. Di 6 bûyerên destavêtinê de tenê cerdevanek hate cezakirin, cerdevanên mayî jî piştî ku demeke kurt girtî man, hatin berdan.

https://anfkurdi.com/jin/destavetina-cerdevanan-politikaya-ser-e-172932

Çavkanî:ANF




## Li Dîlokê du jin di bin çavan de rastî lêgerîna tazî hatin

Li Dîlokê di serdegirtina malan de Mihrîban Aslan û Hatîce Ozaslan hatibûn binçavkirin, herdu jinên ku hatin binçavkirin rastî ferzkirina lêgerîna tazî hatin.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/li-diloke-du-jin-di-bin-cavan-de-rasti-legerina-tazi-hatin-40549

Çavkanî:JINHA




## Jin li gundên xwe xebatên çandiniyê berdewam dikin

Jinên Helepceyê li gundên xwe xebatên xwe yên çandiyê berdewam dikin, bi projeyên ku xistine meriyetê dahatek aborî bi dest dixin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-gunden-xwe-xebaten-candiniye-berdewam-dikin-40548

Çavkanî:JINHA



## Farîda Tejalî: Min dest ji zanist û zanînê berneda

Piştî ku Talîbanê Afganistan dagir kir, wekî gelek kesan xwendina zanîngehê ji bo Farîda Tejalî jî hat astengkirin. Farîda got “Ez bêhêvî nebûm, min dest ji zanist û zanînê berneda. Dixwînim, dinivîsînim û xêz dikim.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/afgan-farida-tejali-min-dest-ji-zanist-u-zanine-berneda-40543

Çavkanî:JINHA



## Jinên Lîbyayî dixwazin tevlî hevdîtinên aştiyê bibin

Çalakvana mafên mirovan Rawîa El-Cezwî xwest ku jinên Lîbyayî yên ku li dijî bandorên wêranker ên şerê li Lîbyayê şer dikin, beşdarî diyalog û pêvajoyên aştiyê yên welat bibin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-libyayi-dixwazin-tevli-hevditinen-astiye-bibin-40542

Çavkanî:JINHA



## [Parêzvanê mafên mirovan ê Belûc û hevjîna xwe bi îşkenceyê hatin kuştin]

Cenazeyên çalakvanê mafên mirovan ê Belûç Hanî Gol û hevjîna wî Samîr Belûç ku 14 roj berê li bajarê Pehla yê Pakistanê hatibûn revandin, li Îranê hatin dîtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/parezvane-mafen-mirovan-e-beluc-u-hevjina-xwe-bi-iskenceye-hatin-kustin-40541

Çavkanî:JINHA



## ‘Jinên Êzidî xwedî ezmûna xweparastinê ne’

Çalakvana Iraqî Bushra Akilî teqez kir ku konferansa jinan a herêmî derfet daye jinên 12 dewletan ku sûdê ji ezmûnên hev bigrin û li dijî hemû krîzan û sîstemên kapîtalîst rewşa xwe bi pêş bixin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-Ezidi-xwedi-ezmuna-xweparastine-ne-40538

Çavkanî:JINHA



## Jina ku rastî şîdetê tê û gefa mirinê lê tê xwarin li benda piştgiriyê ye

L. ya ku ji aliyê mêrê pê re zewicandî ve her dem rastî şîdetê tê û gefa mirinê lê tê xwarin banga pişgiriyê li jinan kir. L. bal kişand ku tevî gilî kiriye jî R.Y. nehatiye girtin û got ku tedbîrên hatine girtin wê naparêzin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jina-ku-rasti-sidete-te-u-gefa-mirine-le-te-xwarin-li-benda-pistgiriye-ye-40537

Çavkanî:JINHA




## Cenazeyê jina li Hatayê winda bûbû hat dîtin

HATAY - Cenazeyê jina bi navê Yasemîn Unlu hate dîtin ku piştî ji mala xwe derketî tu agahî jê nehatibûn girtin û 7 roj bûn winda bû.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216560

Çavkanî:JINNEWS



## [Amadekariya Kampa Havînê ya Jinan dikin](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216546)

ÎZMÎR - Bi pêşengiya Tevgera Jinên Sosyalîst û Komeleya Piştevaniya Jinan a Guzeltepeyê wê 2'yemîn Kampa Havînê ya Jinan bê lidarxistin û jin dê li vir li ser nexşerêya xwe û rewşa jinan a îro bisekin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216546

Çavkanî:JINNEWS



## Îran gef li malbatên qurbaniyên serhildanê dixwe

Bi nêzîkbûna salvegera yekemîn a serhildana “Jin, jiyan azadî” desthilata Îranê hemleyên çewisandinê li dijî xwepêşandêran û çalakvanan zêde kirin.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/ran-gef-li-malbatn-qurbaniyn-serhildan-dixwe-h77643.html

Çavkanî:ANHA



# [Jinên Komunîst ên Şoreşger êrîşa li dijî kedkarên JIN TV şermezar kir](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-komunist-en-Soresger-erisa-li-diji-kedkaren-jin-tv-sermezar-kir-40563)

Jinên Komunîst ên Şoreşger der barê êrîşa duh li dijî kedkarên JIN TV de şermezar kir û diyar kir ku rojnamevanên jin ên ku êrîşên dagirkeriyê ji cîhanê re radigihînin, tên hedefgirtin.

[https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-komunist-en-Soresger-erisa-li-diji-kedkaren-jin-tv-sermezar-kir-40563](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-komunist-en-Soresger-erisa-li-diji-kedkaren-jin-tv-sermezar-kir-40563)

Çavkanî:JINHA

# [Gelê Îkîzkoylulerê ji bo nobeta Akbelenê bang li hûnermenda kirin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/gele-Ikizkoylulere-ji-bo-nobeta-akbelene-bang-li-hunermenda-kirin-40562)

Gelê Îkîzkoylulerê hûnermendê din av de Selda Bagca û Îlkay Akkaya jî he dawetî nobeta daristana Akbelenê kir.

[https://jinhaagency1.com/ku/rojane/gele-Ikizkoylulere-ji-bo-nobeta-akbelene-bang-li-hunermenda-kirin-40562](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/gele-Ikizkoylulere-ji-bo-nobeta-akbelene-bang-li-hunermenda-kirin-40562)

Çavkanî:JINHA



## [‘Ji bo azadiya me hevkariya di nava rêxistinên jinan de giring e’](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-bo-azadiya-me-hevkariya-di-nava-rexistinen-jinan-de-giring-e-40558)

Jinê ku bejdarî konfaransa li Beyrûtê hatî li darxistin bûne, bal kişandin ser giringiya avakirian tora di nava femînsîtan de û gotin: “Ji bo jinên herêmê bigihin azadiya xwe hevkariya di nava rêxistinên jinan de giring e.”

[https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-bo-azadiya-me-hevkariya-di-nava-rexistinen-jinan-de-giring-e-40558](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-bo-azadiya-me-hevkariya-di-nava-rexistinen-jinan-de-giring-e-40558)

Çavkanî:JINHA



## [Samar Jamil: tundiya ku min dijiya malbat asayî dîdît](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/samar-jamil-tundiya-ku-min-dijiya-malbat-asayi-didit-40557)

Samar Şamîlê Misrî anî ziman ku şîdeta di dema zewaca xwe de lê hatiye kirin ji aliyê malbatê ve normal tê dîtin, tevî gefên kuştinê yên hevserê xwe û zextên malbatan jî ji bo pêkanîna biryara berdanê têdikoşe.

[https://jinhaagency1.com/ku/rojane/samar-jamil-tundiya-ku-min-dijiya-malbat-asayi-didit-40557](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/samar-jamil-tundiya-ku-min-dijiya-malbat-asayi-didit-40557)

Çavkanî:JINHA



## 'Di mijara guhertina zagona înfazê de jin neanîn rojevê'

AMED - Endama Navenda Mafên Jinan a Baroya Amedê Elif Tirenç Îpek Ulaş da zanîn cudakariya di navbera hukumxwarên siyasî û edlî dîsa tê kûrkirin û got:"Dema ku zagona înfazê ya dawî hat çêkirin di aliyê tundiya li ser jinê tê kirin de nehat nirxandin. Di mijara guhertina zagona înfazê de jin neanîn rojevê."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/216596

Çavkanî:JINNEWS



## Li Cebel El Ereb jinan li hember zilm û neheqiyê serî rakir - Hêvîdar XALID

https://www.hawarnews.com/kr/haber/li-cebel-el-ereb-jinan-li-hember-zilm-neheqiy-ser-rakir-hvdar-xalid-h77656.html

Çavkanî:ANHA



## [Aktivîsta derdorê Denîz Gumuşel: Darên Akbelen û Cûdiyê yek in](https://jinhaagency1.com/ku/ekoloji/aktivista-derdore-deniz-gumusel-daren-akbelen-u-cudiye-yek-in-40569)

Endezyara derdorê Denîz Gumuşel ku ji ber li dijî jêkirina darên li Akbelenê têdikoşiya hatibû binçavkirin û ketina wê ya Mîlasê hatibû qedexekirin, têkildarî talana tê kirin got: "Hemû daristan, darên li Akbelen û Cûdiyê yek in."

https://jinhaagency1.com/ku/ekoloji/aktivista-derdore-deniz-gumusel-daren-akbelen-u-cudiye-yek-in-40569

Çavkanî:JINHA



## [Ji konferansa jinan banga rizgarkirina jinên Êzidî yên hê dîl girtî ne](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-konferansa-jinan-banga-rizgarkirina-jinen-Ezidi-yen-he-dil-girti-ne-40570)

Beşdarên konferansa jinan a ku li paytexta Lubnan Beyrûdê hat lidarxistin, teqez kirin ku jinên Êzidî dikaribûne ji xweliyê xwe vejînin û li pêşiya DAIŞ'ê rawestin û banga xurtkirina têkoşîna ji bo rizgarkirina jinên dîlgirtî kirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-konferansa-jinan-banga-rizgarkirina-jinen-Ezidi-yen-he-dil-girti-ne-40570

Çavkanî:JINHA



# Ji Meryem Kaya ku bi tundiyê re rûbirû hat 17 roj in tu agahî nine

Ji Meryem Kaya ku di 17 saliya xwe de ji aliyê Alî Işik ve hat revandin û li Bursayê bi mehra olî hat zewicandin û paşê ji ber bi tundiyê re rûbirû ma li stargehê bi cih bû, 17 roj in tu agahî nayê girtin. Dayika wê Nebahat Kaya banga piştevaniyê kir.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-meryem-kaya-ku-bi-tundiye-re-rubiru-hat-17-roj-in-tu-agahi-nine-40575

Çavkanî:JINHA



**Nûçeyên herêmî**

## [Berdevka PYD'ê: Dewleta Tirk demografya Kurdistanê diguherîne](https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/berdevka-pyd-e-dewleta-tirk-demografya-kurdistane-diguherine-40493)

Berdevka Partiya Yekitiya Demokratîk PYD'ê Sema Begdaş siyaseta dewleta tirk a guhertina demografiya Kurdistanê nirxand.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/berdevka-pyd-e-dewleta-tirk-demografya-kurdistane-diguherine-40493

Çavkanî:JINHA



## [Arzo Temo: Azadiya jinan azadiya civakê ye](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/arzo-temo-azadiya-jinan-azadiya-civake-ye-40506)

Berdevka Rêxistina Sara ya li dijî tundiya li ser jinê ya Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê Arzo Temo teqez kir ku qetilkirina jinan ji ber pirsgirêkên hişmendiya baviksalarî tê û got têkoşîna wan a li hemberî vê hişmendiyê dê bi kûrbûnê bidome.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/arzo-temo-azadiya-jinan-azadiya-civake-ye-40506

Çavkanî:JINHA



## Deq mîrate û çandeke kevnar e

Deq adetek civakî û nîşaneyên xemilandina jinan e, dapîrên me bi salan vê çandê parastine.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/deq-xwedi-candeke-kevnar-e-40526

Çavkanî:JINHA



## Nalîn Dîcle: Bi êrişên li ser rojnamevanan nikarin rastiyan veşêrin

Rojnamevan Nalîn Dîcle êrîşên dewleta tirk ên li ser ragihandinê nirxand û got: "Dixwazin bi êrîşan çapemeniya azad bêdeng bikin û kiryarên hovane ji raya giştî yên cîhanê veşêrin."

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/nalin-dicle-bi-erisen-li-ser-rojnamevanan-nikarin-rastiyan-veserin-40568

Çavkanî:JINHA



# [Navenda Fînîqiya ji bo pêşxistina karînên zarokan kar dike](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/navenda-finiqiya-ji-bo-pesxistina-karinen-zarokan-kar-dike-40573)

Navenda Fînîqiya zarok û ciwanên civakê perwerde dike û karîn û pîşeyên wan bi pêş dixe da ku bikaribin civakeke pêşketî ava bikin

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/navenda-finiqiya-ji-bo-pesxistina-karinen-zarokan-kar-dike-40573

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

26/8/2023